# Bultena heftane

# 3/2/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## [Li Elmanyayê nêzî 17 hezar zarokên keç dibin metirsiya sinetkirinê de ne](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-elmanyaye-nezi-17-hezar-zaroken-kec-dibin-metirsiya-sinetkirine-de-ne-43543)

Rêxistina mafê jinan Terre des Femmes a li Elmanyayê, bi boneya 6'ê Sibatê Roja Navneteweyî ya Dijî Sinetkirina Jinan ragihand ku tenê li Elmanyayê, nêzî 17 hezar zarokên keç di bin metirsiya sinetkirinê de ne û got ku ew pêkanîn bi veşartî tê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-elmanyaye-nezi-17-hezar-zaroken-kec-dibin-metirsiya-sinetkirine-de-ne-43543

Çavkanî:JINHA




## Li Romayê konferansa 'Azadiya jinê û Abdullah Ocalan'

NAVEND NÛÇEYAN - Li paytexta Îtalya Romayê wê konferansa "Azadiya jinê û Abdullah Ocalan" bê lidarxistin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226724

Çavkanî:JINNEWS



# Nûnera taybet a NY'yê bang li Tirkiye û Îranê kir

NAVENDA NÛÇEYAN - Nûnera Taybet a NY'yê ya Iraqê ragihand ku êrişên leşkerî yên Tirkiye û Îranê li ser xaka Herêma Federal a Kurdistanê dibin sedema fikaran û bang li welatan kir.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226704

Çavkanî:JINNEWS



## Rapora MKG'ê: Di meha çileyê de jî jinên rojnameger hatin darizandin

AMED - MKG'ê di rapora xwe ya binpêkirina mafên jinên rojnameger de diyar kir ku di meha çileyê de jî jinên rojnameger hatine darizandin û hat ragihandin niha 9 jinên rojnameger ji ber xwestine karê xwe bikin, di girtîgehan de tên girtin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226335

Çavkanî:JINNEWS




## Siyasetmedara girtî Nûrhayat Altûn tev li cenazeyê birayê xwe bû

ENQERE - Hevşaredara Dêrsimê ya hatiye girtin û li şûna wê qeyûm hatiye tayînkirin Nûrhayat Altin, tev li merasîma cenazeyê birayê xwe Hasan Altûn bû.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226360

Çavkanî:JINNEWS



## Li dijî komployê hêrs: Wê negihêjin armanca xwe

STENBOL - Jin der barê salvegera komployê de axivîn û diyar kirin ku wê komplo negihêje armanca xwe.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226377

Çavkanî:JINNEWS



## Menîce Gulmez: Eziyeta mezin jin dikşînin

AMED - Menîce Rumeysa Gulmez da zanîn ku di şerên li Rojhilata Navîn tên jiyîn de yên herî zêde bi bandor dibin jin û zarok in û got sedema şer ne Îslamiyet, sedem daxwaza serdestkirinê ye.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226381



## 'Ji namzetên jin yên bi hêz ditirsin'

MUGLA - Ji Însiyatîfa Welatiyan Zeynep Akinci da zanîn ku ew meclîsên ji mêran ava dibin naxwazin û got wê jin cudahiyek mezin biafirînin. Zeynebê wiha got: “Jinên bi hêz û bi tecrube hene. Çima evqas ji van jinan ditirsin.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226383

Çavkanî:JINNEWS



## Manşeta Kovara Jînê ya vê hefteyê erdhej bû

STENBOL - Kovara Jînê vê hefteyê bi manşeta “Jin, zarok, astengdar... hêj di bin kavilên ranta we de ne” derket.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226397

Çavkanî:JINNEWS



# Jinên Amazigh hewl didin çanda xwe ji tunebûnê biparêzin

Ji Komeleya Çandê ya Amazigh a Tûnisê Mabrouka Tawjounî diyar kir ku jinên Amazigh di parastina çanda xwe de xwedî roleke girîng in û destnîşan kir ku jinên Amazigh dî dorêkê de bi aliyên xwe yên şervan tên nasîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-amazigh-hewl-didin-canda-xwe-ji-tunebune-biparezin-43487



# Li Sûdanê li dijî destdirêjî û tundiya zayendî kampanya hat destpêkirin

Li Sûdanê ji ber nakokiyên di navbera Artêşa Piştgiriya Lezgîn û Hikûmeta Sûdanê de li dijî tundiya zayendî û destavêtinê yên li dijî jin û zarokên keç "Kampanyaya bi hev re ya li dijî destavêtin û tundiya zayendî" hat destpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-sudane-li-diji-destdireji-u-tundiya-zayendi-kampanyaya-hat-destpekirin-43494

Çavkanî:JINHA



## Jinên mexdûrên erdhejê: Em ji bo pereyê nanek bênavber dixebitin

Erdheja li Antakyayê li ser îstîhdama jinan bandorek mezin çêkir. Jinan diyar kirin ku ji bo pereyê nan bênavber dixebitin û wiha gotin: "Bi erdhejê re me ne tenê malên xwe, pêşeroja xwe jî winda kir. Li vê derê barê her tiştî li ser milên jinan e."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexduren-erdheje-em-ji-bo-pereye-nanek-benavber-dixebitin-43500

Çavkanî:JINHA



## Nora Merîno ya enternasyonalîst: Rêber Apo rêberê gelan û jinan e

Nora Merîno ya enternasyonal bal kişand li ser tecrîda girankirî ya hêzên navnetewî dimeşînin û 26 sal in li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin û got ku Ocalan bi paradîgmaya xwe bûye rêberê gelan û jinan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/nora-merino-ya-enternasyonalist-reber-apo-rebere-gelan-u-jinan-e-43501

Çavkanî:JINHA



## [Bi gulên ku bi destan çêdike debara xwe dike](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/bi-gulen-ku-bi-destan-cedike-debara-xwe-dike-43502)

Bexşîn Mihemed yek ji wan ciwanane ku peymangeh temam kiriye, bi rêya destrengiya xwe bi awayek cûda gulan çêdike û bi wan gulan dahata jiyana xwe dabîn dike.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/bi-gulen-ku-bi-destan-cedike-debara-xwe-dike-43502

Çavkanî:JINHA




## Li Assiutê jin bi ava hinaran hilberînê dikin

Li bajarê Assiut ê Misirê jinên ku ava hinaran derdixin, li bajarên cuda tevli fiaran dibin. Asma Ahmed Mahran a ji bo jinan projeyê amade kir diyar kir ku armanca wan ew e jinan zêdetir tevli pêvajoyên hilberînê bikin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-assiute-jin-bi-ava-hinaran-hilberine-dikin-43503

Çavkanî:JINHA



## Parlamentera Mexrîbî: Jin şopa xwe li parlementoyê dihêlin

Parlamenter Lubna El-Saghirî diyar kir ku weke jinên Mexrîbê ji bo valahiyê tijî bikin beşdarî meclîsê nebûne û got: “Jin şopa xwe li parlementoyê dihêlin. Hemû jin di meclîsê de xwedî hebûneke bi bandor in.”

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/parlamentera-mexribi-lubna-el-saghiri-jin-sopa-xwe-li-meclise-dihelin-43506



## Hejan Xalid: Ji bo jin li hemberî tundiyê têbikoşin, pêwîstî bi hişyarbûnê heye

Lêkolîner û mamostayê Zanîngeha Silêmaniyê Hejan Xalid anketa xwe ya herî dawî derbarê tundiya li ser jinan di dezgehên çapemeniyê de kiriye, eşkere kir ku zêdeyî nîvê jinan di dezgehên çapemeniyê de bi tundiyê re rûbirû dimînin û got; “Divê asta hişyarbûna jinan pir zede be, da ku bikaribin li dijî tundiya li ser wan têbikoşin.”

https://rojnews.news/ku/?p=30441

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Silêmaniyê, bi şêweyek guman jinek jiyana xwe ji dest da

Li Silêmaniyê jinek bi şêweyekî guman jiyana xwe ji dest da. Rêveberiya Ragihandinê ya Polîsên Silêmaniyê di derbarê buyerê de ragihand ku buyerek xwekujî bû ku ti nîşanek din li ser nebû û hevserê wê jî hate binçavkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=304273

Çavkanî:ROJNEWS



## Jinên Helebceyê: Berhemên Tirkiyeyê ziyanek mezin didin karê jinan

Li Helebceyê gelek jin xwedî pîşe û karê xwe yê taybetin, lê ji ber ku Hikumeta Herêmê piştgiriya wan nake, berhemên wan jî di dest de dimînin. Li gorî jinan, berhemên Tirkiyeyê ziyanek mezin didin bazara navxwe ya herêmê.

https://rojnews.news/ku/?p=304079

Çavkanî:ROJNEWS



## Platforma Jinan a Enqerê mexdûrên erdhejê bi bîr anî

ENQERE - Jinên di salvegera erdheja 6'ê Sibatê ya Mereşê de li ber Abîdeya Mirovahiyê hatin cem hev û bi mûm û pankartên di destên xwe de meşeke bêdeng li dar xistin û gotin, "Em ê ji bîr nekin, efû nekin, em ê li ber xwe bidin."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226495

Çavkanî:JINNEWS




## Bendewariya wan ji dewletê tune ye tenê mafê xwe dixwazin

Erdhejzedeyên Elewî yên Antakyayê diyar kirin ku ji aliyê dewletê ve rastî cihêkariyê hatine û bi tenê hatine hiştin, dan zanîn ku tu bendewariyek wan ji dewletê tune ye, tenê dixwazin pirsgirêkên bicihbûnê ku mafên wan e werin çareserkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bendewariya-wan-ji-dewlete-tune-ye-tene-mafe-xwe-dixwazin-43515

Çavkanî:JINNEWS



## Li Morîtanyayê karsazî êdî ne tenê para mêran e

Konseya Jinan a Kar ya Morîtanya ji bo jin di jiyana kar de hê bibandor bin gelek proje pê xistin, bi karsaziyê êdî di hemû sektoran de jin dikarin hebûna xwe bidin diyarkirin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-moritanyaye-karsazi-edi-ne-tene-para-meran-e-43516

Çavkanî:JINNEWS



## Jinên Tûnisê: Di wesayîtên komguhêz de tacîza zayendî belav dibe

Li Tûnisê, tijîbûna wesayîtên komguhêz ên li ser kapasîteya xwe, dibe sedema zêdebûna bûyerên tacîza zayendî ya li dijî jinan û jinên li dijî tacîzê dengê xwe derdixin jî rastî gefan tên.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunise-di-wesayiten-komguhez-de-taciza-zayendi-belav-dibe-43518

Çavkanî:JINHA



## [Derbarê endama KJAR'ê Warîşe Muradî îdeaname hate amadekirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/derbare-endama-kjar-warise-muradi-ideaname-hate-amadekirin-43523)

Derbarê endama KJAR Warîşe Muradî ku beriya salekê ji aliyê hêzên hikumeta Îranê ve hatibû revandin û piştî 70 rojan derket holê ku hatiye girtin, bi sucê 'Li dijî ewlehiya netewî tevger kiriye' îdeaname hate amade kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/derbare-endama-kjar-warise-muradi-ideaname-hate-amadekirin-43523

Çavkanî:JINHA



## [Parêzer Peyman Ezedîn: Daraz li gor berjewendiya kesan dimeşe](https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/parezer-peyman-ezedin-daraz-li-gor-berjewendiya-kesan-dimese-43524)

Parêzer Peyman Ezedîn a derbarê destwerdana partî û kesan li ser darazê de axivî, anî ziman ku li Başurê Kurdistanê daraz û pêkanîna zagonan ne serbixwe ye ev jî rê li çareser nekirina pirsgirêkan û dozan vedike.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/parezer-peyman-ezedin-daraz-li-gor-berjewendiya-kesan-dimese-43524

Çavkanî:JINHA



## ‘Em dixwazin feraseta civakî biguherînin’

Sê jinên ku li Suweydayê xwaringeh vekirin, ji aliyekî vê feraseta civakî diguherînin û ji aliyekî jî hem serxwebûna xwe ya aborî bi dest dixin û hem jî ji jinan re îstihdamê peyda dikin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/em-dixwazin-feraseta-civaki-biguherinin-43532

Çavkanî:JINHA



## Di hilbijartinên Tûnisê de li dijî astengdaran gelek binpêkirin hatin tesbîtkirin

Di hilbijartinên meclisên xwecihî yên Tûnisê de li dijî ferdên astengdar gelek binpêkirin hatin tespîtkirin. Sekretera Giştî ya Rêxistina Parastina Mafên Astengdaran a Tûnisê Bourawiya Al-Aqrabî, diyar kir ku ji bo astengdaran mercên guncaw tune bûne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-hilbijartinen-tunise-de-li-diji-astengdaran-gelek-binpekirin-hatin-tesbitkirin-43536

Çavkanî:JINHA



## Çalakvana Efganî: Em li gel jinên Kurd in

Yek ji çalakvanên mafên jinan ên Efganistanê Latîfah Ahmadî, suîqesta Firyal Silêman Xalid bi bîr xist û wiha got: “Nêzî nîv sedsal e gelê wêrek ê Kurdistanê têdikoşe û tê çewisandin lê tu zext nekare meşaleya azadiya wan vemirîne.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakvana-afgani-tu-zext-nikare-mesaleya-azadiya-jinen-kurd-vemirine-43538

Çavkanî:JINHA



## EŞÎK: Li herêmên erdhejê jiyana jin û zarokan dijwartir dibe

EŞÎK’ê, bi boneya salvegera erdhejên 6’ê Sibatê daxuyaniyeke nivîskî da û wiha got: “Em ê li rêveberiya Afetê, rêveberiyên xwecihî û li her derê dev ji wekheviyê bernedin. Em ê heta erdhejek din li bendê nesekinin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/eSIk-li-heremen-erdheje-jiyana-jin-u-zarokan-dijwartir-dibe-43546

Çavkanî:JINHA



## Koroya Deniz Poyraz ava kirin

ÎZMÎR - Jinên li Çigliyê li dijî tundiya li ser jinê û komkujiyên li ser jinan disekinin Koroya Deniz Poyraz ava kirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226510

Çavkanî:JINNEWS




## Meşvana azadiyê Newroz Uysal: Em ji gelê xwe hêzê digirin

MÛŞ - Meşvana "Meşa Mezin a Azadiyê", parlamentera DEM Partiyê Newroz Uysal di Baskê Qersê de cih digire wiha bal kişand ser meşê: “Em ji bo bi destxistina azadiya fîzîkî ya Birêz Abdullah Ocalan têkoşîna xwe bidomînin. Em wek meşvanên azadiyê jî dengê bi milyonan kesî radigihînin û em ê berxwedana xwe bidomînin."

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226523

Çavkanî:JINNEWS




## Hunermendên jin ên Silêmaniyê, bi tabloyên xwe hest û çîrokên jiyana xwe vedibêjin

Di her pêşengeh û festîvalên ku têne lidarxistin de herî zêde reng û jêhatinên jinên derdikevin pêş. Wek hunermendên jin bi xwe dibêjin, bi rêya hunerê hest, êş û çîrokên xweş û xemgîn yên jiyana xwe dikarin nîşan bidin.

https://rojnews.news/ku/?p=304574

Çavkanî:ROJNEWS



## Sinetkirina Jinan hîna bi awayek veşartî dewam dike!

Tevî hewlên berdewam yên ji bo jinavbirina sinetkirina jinan, her tim metirsiya dubare derketina holê heye, li gorî amarên dawî, her sal bi milyonan jin dibin qurbaniyên vê diyardeyê û her diçe zêde dibe.

https://rojnews.news/ku/?p=304701

Çavkanî:ROJNEWS



## Sala borî li Herêma Kurdistanê 100 jin hatine sunetkirin

Rêxistina WADI ya Almanî daneyên sunetkirina jinan li Herêma Kurdistanê taybet ji ajansa me re ragihand û diyar kir ku sala borî 100 sunetkirinên jinan hatine tomarkirin û metirsiya wê jî ewe ku hemû jinên bûne qurbaniyê sunetkirinê di bin 18 saliyê de ne.

https://rojnews.news/ku/?p=304944

Çavkanî:ROJNEWS




## Koordînasyona Jinan rapora erdhejê eşkere kir

NAVENDA NÛÇEYAN - Koordînasyona Jinan rapora xwe ya li ser rewşa jinan a li herêma karesatê ya piştî erdheja 6’ê Sibatê parve kir. Di raporê de hat diyarkirin ku jinan herî zêde daxwaza piştgiriya xurek û piştgiriya derûnî kirine.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226642

Çavkanî:JINNEWS



## Li Lîbyayê bi ‘Bazara Alîkariya Jinan’ piştgirî ji nexweşên penceşêrê re tê dayîn

Li Lîbyayê bi armanca piştgiriya bi nexweşên penceşêrê re ‘Bazara Alîkariya Jinan’ hat vekirin. Di bazarê de piştgiriya madî ji bo nexweşên penceşêrê yên ku tu dahatek wan nîn e tê dayîn, jin jî bi projeyên xwe tê de cih digrin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-libyaye-bi-bazara-alikariya-jinan-pistgiri-ji-nexwesen-pencesere-re-te-dayin-43555

Çavkanî:JINHA



## Derbarê Hevserok Fîlîz Buluttekîn de 15 sal cezayê girtîgehê hat xwestin

Di doza Hevşaredara Sûrê Fîlîz Buluttekîn a ku qeyûm tayînî şûna wê hat kirin tevî biryara betalkirinê ya Dadgeha Îstînafê jî 15 sal cezayê girtîgehê hat xwestin.

https://jinhaagency.com/ku/hiq%C3%BBq/derbare-hevserok-filiz-buluttekin-de-15-sal-cezaye-girtigehe-hat-xwestin-43554

Çavkanî:JINHA



## Hayat Al-Attar: Di sektora çandiniyê de jin rastî her cure tundiyê tên

Aktivîst Hayat Al-Attar diyar kir ku li Tûnisê bi xebatên ku li 13 eyaletan dane meşandin tesbît kirine ku karkerên jin ên çandiniyê, rastî kedxwarî û tundiyê tên û da zanîn ku di mijara mafên karkeran de pêwîst e zagon werin pêkanîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hayat-al-attar-di-sektora-candiniye-de-jin-rasti-her-cure-tundiye-ten-43552

Çavkanî:JINHA



## Li herêma erdhejê jin û zarok nikarin xwe bigihînin xizmetên tenduristiyê!

Li Antakyayê ku ji ber erdheja 6’ê Sibatê ya ku navenda wê Mereşê pêk hat, zarok derzîlêdanên xwe di wextê xwe de nikarin pêk bînin. Nexweş ji ber şert û mercên hema bêje ne mumkin neçar dimînin ji bo dermankirinê derkevin derveyî bajêr.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-herema-erdheje-jin-u-zarok-nikarin-xwe-bigihinin-xizmeten-tenduristiye-43549

Çavkanî:JINHA



## Jinên efgan NY hişyar kirin ku Talîbanê rewa neke

ENQERE - Jinên efgan bertek nîşanî tevlibûna Talîban a civîna dema pêş ji aliyê NY'yê ve were kirin dan. Jinan destnîşan kirin ku ev rewş Talîbanê rewa dike û NY hişyar kirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226706

Çavkanî:JINNEWS



## Yuksel Genç: Neçareseriya pirsgirêka kurd bandorê li denga hilbijêran dike

AMED - Kordînatora Giştî ya Navenda Lêkolîna Qada Polîtîk Civakî Yuksel Genç, beriya hilbijartinan,  der barê tayînkirina qeyûman ku wê bandoreke çawa li ser tercîha hilbijêran bike de nirxandin kir. Yukselê destnîşan kir ku neçareseriya pirsgirêka Kurd bandorê li dengê hilbijêran dike.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226672

Çavkanî:JINNEWS



## Li Xarpêtê jinek ji aliyê çawişê pispor ve hat qetilkirin

Li Xarpêtê çawişê pispor ê bi navê Murat Coşan Burcu Demîr a ku dixwest wî berde qetil kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-xarpete-jinek-ji-aliye-cawise-pispor-ve-hat-qetilkirin-43582

Çavkanî:JINHA




## 'Ger em bibin yek em ê bi hêztir bibin'

Derûnînasa Efgan Yalda Ahmad, bertek nîşanî qetilkirina siyasetmedar Firyal Silêman Xalid ku li çendek berê li Kerkûkê qewimî da û da zanîn ku ew li gel têkoşîna jinên Kurd in.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ger-em-bibin-yek-em-e-bi-heztir-bibin-43575

Çavkanî:JINHA



## Jinên reşik ên li Yemenê bi her cure kedxwariyê re rû bi rû ne

Li Yemenê jin û zarokên keç ên reşik rastî cihekariyê tên, bi gelek zehmetiyên ku bandorên xirab li jiyana wan dike re rû bi rû dimînin. Her wiha ji ber rengê çermê xwe rastî tacîz, tundî û cudakariyê tên.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-resik-en-li-yemene-bi-her-cure-kedxwariye-re-ru-bi-ru-ne-43573

Çavkanî:JINHA



## Jinên Tûnisê ji bo hunera berhemên ji hiriyê bidome piştgiriyê dixwazin

Maysaa Abouda û Hasna Salama yên li bajarê Hazwa yê Tûnisê dijîn, diyar kirin ku hunera kulav ku mîraseke çandî ya bajarê Hazwayê ye; ji ber madeya wê ya xam buha ye, ber bi tunebûnê ve diçe û xwestin ji bo parastina vê mîrasê piştgirî were dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-tunise-ji-bo-hunera-berhemen-ji-hiriye-bidome-pistgiriye-dixwazin-43572

Çavkanî:JINHA



## ‘Hewldan mafê min e’ li dijî tundiyê pir alî dixebite

Parêzer Nancy Mûhemmad diyar kir ku armanca wan ew e li Îskenderiyeyê bi sernavê ‘Hewldan mafê min e’ li dijî tundiyê hişyariyê ava bikin, bal kişand ser bajarê Beheira û behsa xebatên ku di sala 2024’an de bidin meşandin kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hewldan-mafe-min-e-li-diji-tundiye-pir-ali-dixebite-43571

Çavkanî:JINHA



## Ayşe Kaşikirik: Li Tirkiyeyê jin ji aliyê partiyan ve nayên dîtin

Di 31’ê Adarê de li Tirkiyeyê hilbijartin heye lê ne di lîsteyan ne jî di beyanameyan de jin tune ne. Ji Tora Berfirehî û Wekehviya Kurewî Ayşe Kaşikirik, bi gotinên “Jinan rantê îfşa kirin” diyar kir ku ji ber vê yekê ji nedîtîve tên dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ayse-kasikirik-li-tirkiyeye-jin-ji-aliye-partiyan-ve-nayen-ditin-43569

Çavkanî:JINHA



## ‘Şiyanên jinan xezîneyeke mezine ku divê jin xwe bispêrinê’

Jin di hemû qadên jiyanê de xwedî şiyan û jêhatiniyên bêhempa ne. Ji ber vê yekê divê baweriya wan bi xwe hebe. Parlamentereke jin a berê dibêje; “şarezayiya jinê sermayek mezine ku divê jin xwe bispêre şiyanên xwe.”

https://rojnews.news/ku/?p=305006

Çavkanî:ROJNEWS




## Kujerê rast yê jinekê derket hole

Di encama lêkolîna polîsan de rastiya kuştina jinek li Kerkûkê derket holê û diyar bû ku kujer hevjînê jinê bixwe ye, ne zaroka wê ye.

https://rojnews.news/ku/?p=305072

Çavkanî:ROJNEWS



## [‘Şer û qeyran yek ji sedemên zêdebûna diyardeya sunetkirina jinane’]

Sunetkirina jinan sûcê mirovahiyê ye û li seranserê cîhanê qedexe ye. Lê her tim ji bo jinan tehdîdeke û nehatiye ji holê rakirin. Çalakvan di wê baweriyê de ne ku şer û alozî dibe sedema vejîna sunetkirina jinan.

https://rojnews.news/ku/?p=305222

Çavkanî:ROJNEWS



## [Werîşe Mûradî bi rakirina çekê û rawestana li dijî dewletê tê tometbarkirin]

Piştî derbazbûna şeş mehan bi ser binçavkirina çalakvana mafên jinan û endama KJAR’ê Werîşe Mûradî ji aliyê rejîma Îranê ve wê bi rakirina çekê û rawestana li dijî dewletê tometbar dike.

https://rojnews.news/ku/?p=305395

Çavkanî:ROJNEWS



## Di meha çileyê de 27 jin hatin qetilkirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li gorî çeteleya tundiyê ya meha Çile 27 jin û 4 arok hatin qetilkirin, 17 jin û 3 zarokan jî bi guman jiyana xwe ji dest dan.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226757

Çavkanî:JINNEWS




## Burcu Demîr a ji aliyê Çawîşê Pispor ve hate qetilkirin hat defin kirin

Burcu Demîr a ji aliyê Çawîşê Pispor Mûrat Coşan ve hate qetilkirin, li ser milên jinan ber bi bêdawîtiyê hate oxirkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/burcu-demir-a-ji-aliye-Cawise-pispor-ve-hate-qetilkirin-hat-defin-kirin-43598

Çavkanî:JINHA



# Jinên karker ên li Mexribê ji bo saeta mijandina zarokan têdikoşin

Li Mexribê di rojên dawî de bêparkirina dayikên karker ji mafê mijandina zarokan tê axaftin. Jinên Mexribê dixwazin ji saeta şîrdanê ya aliyê qanûnên kar ve ketiye bin temînatê, bi tevahî sûdê bigrin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-karker-en-li-mexribe-ji-bo-saeta-mijandina-zarokan-tedikosin-43589

Çavkanî:JINHA



# Jinên karker ên Tekstîla Ozak: Bila tu kes ji têkoşînê netirse

Berxwedana ku karkerên Tekstîla Ozak li dijî zext û mobîngê li Rihayê dabûn destpêkirin, li Holdîng Tekstîla Ozakê ya li Stenbolê didome. Seher Gulen û Aysel Bagcî yên ji tekstîla Ozakê ji kar hatin avêtin gotin; “Em şanaz in, me bi tenê nehêlin.”

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-karker-en-tekstila-ozak-bila-tu-kes-ji-tekosine-netirse-43586



## Koma Sketch bi xebatên xwe yên şanoyê hişyarkirina civakê armanc dike

“Sketch” komeke şanoyê ya înteraktîf e ku li çareseriyan digere da ku pêşandanên wê bibin beşek ji guhertinê. Jinên şanoger dibêjin ku bi awayekî komedî yan jî dramî, beşdarî pêşketina şanoyê dibin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/koma-sketch-bi-xebaten-xwe-yen-sanoye-hisyarkirina-civake-armanc-dike-43484

Çavkanî:JINHA



## Di meha Çileyê de 2 ji wan jin 4 kes hatine qetilkirin

Li gor Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyeyê, dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wî di meha Çileyê de 2 ji wan jin 4 kes qetil kirin û zêdekirî 50 kesî revandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efrine-2-ji-wan-jin-4-kes-hatin-qetilkirin-43508

Çavkanî:JINHA



## Serpêhatiyên civaka xwe bi reqsa lîrîk derdixe ser dike

Îzdihar Tahir ku ji zarokatiya xwe ve bi reqs û şanoyê re eleqedar e, bi performansa ku bi reqsa lîrîk amade kiriye serpêhatiyên gelê xwe vedibêje.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/serpehatiyen-civaka-xwe-bi-reqsa-lirik-derdixe-ser-dike-43517

Çavkanî:JINHA



## Kovan a hat rizgarkirin: Hêviya min rizgarkirina hemû jinên Êzidî ye

Kovan Îdo Xorto ya Êzidî a ku YPJ'ê di qonaxa sêyemîn ji Operasyona Mirovî û Ewlehiyê li Kampa Holê wê rizgar kir serpêhatiya xwe ya revandina ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve qal kir û got "Hêviya min rizgarkirina hemû jinên Êzidî ye."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kovan-a-hat-rizgarkirin-heviya-min-rizgarkirina-hemu-jinen-Ezidi-ye-43519

Çavkanî:JINHA



## Li Efrînê 2 jê jin 4 kes hatin revandin

Komên çeteyên dewleta Tirk a dagirker li Efrîna dagirkirî 2 jê jinên ciwan ên astengdar 4 kes revandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efrine-2-je-jin-4-kes-hatin-revandin-43525

Çavkanî:JINHA




## 'Divê em jin û zarokên keç ji her cure îdeolojiya paşverû rizgar bikin'

Ji Navenda Lêkolînên Jineolojî Sidiqa Halo, diyar kir ku pêwîst e jin û zarokên keç ji her cure îdeolojiyên paşverû bên rizgarkirin û da zanîn ku li dijî tundiyê xebatên wan ên hişyarkirinê didomin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-em-jin-u-zaroken-kec-ji-her-cure-ideolojiya-pasveru-rizgar-bikin-43535

Çavkanî:JINHA



## Trajediya jin û zarokên Idlibê didome

Jin û zarokên Idlibê, hewl didin li kampên ku li dijî karesata ji ber şer û erdhejê çêbûye, di nava tirs û bêewlehiyê de jiyana xwe didomînin. Zarokên ku gotin kabûsê dibînin, diyar kirin ku dixwazin di nava şert û mercên germ de bijîn.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/trajediya-jin-u-zaroken-idlibe-didome-43540

Çavkanî:JINHA



## 20 sal cotkariyê dike: Firyal Cembelî

Hemwextî ku cîhan berê xwe dide bikaranîna xwarinên çêkirî, Firyal ji zêdetirî 20 salan ve di zeviyan de dixebite da ku sebzeyan ji mala xwe re peyda bike û debara jiyana xwe û ya malbata xwe bike.

https://hawarnews.com/kr/20-sal-cotkariye-dike-firyal-cembeli

Çavkanî:ANHA



## Li Idlibê kampên bi kon barê jinan girantir dikin

Li Idlibê jinên ku neçar man ji cih û warên xwe derkevin û li kampên bi konan de bijîn, hem karên paqijiyê û çêkirina xwarinê li ser milên wan e hem jî li dijî zehmetiyan têdikoşin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-idlibe-kampen-bi-kon-bare-jinan-girantir-dikin-43594

Çavkanî:JINHA



## ‘Tev-Çandê di parastina çanda pêkhateyan de roleke girîng lîst’

8’emîn Konferansa Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê li Qamişlo hat lidarxistin. Jinên ji pêkhateyên cuda yên beşdarî konferansê bûn, gotin: “Tev-Çandê di parastina çanda pêkhateyan de roleke girîng lîst.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/tev-Cande-di-parastina-canda-pekhateyan-de-roleke-giring-list-43585

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

10/2/2024